# Nemana rêjîma Îranê ewlehiya Rojhilata Navîn ewle dike

»»» R:4



# Heya niha jî bi kutikê Kawe serê me tê kutan

»»» R:10

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (462) 21-01-2024 Buha (1000) Tûmen*

# Kurd neteweyekî mirovhez qencîxwaz, aştîhez e.

»»» R:5

# Daxûyaniya Hizba demokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 78 emîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê

»»» R:2

## NAVENDA BIRÊVEBERIYA HIZBA DEMOKRAT: “ EM ÊRÎŞA BO SER SERWERIYA AXA ÎRAQ Û HERÊMA KURDISTANÊ ŞERMEZAR DIKIN”



**Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Navenda Birêbeberiya Giştî**
**26ê Befranbara 1402 a Rojî**
**16ê January 2024**

Şeva 25 li ser 26ê Befranbara 1402 a Rojî, beranber bi 15 li ser 16ê Kanûna duyem a 2024 a Zayînî, çend cihên medenî li Hewlêra paytexta Herêma kurdistanê, ji aliyê spaha pasdaran a rejîma Îranê ve kirine armanc û hatine mûşekbaran kirin. Li encama vê destdirêjiya spaha pasdaran bo ser Herêma Kurdistanê û cihê rûniştina nûneratiyên biyanî û dîplomatên biyanî û balafirxaneya navnetewî ya Hewlêrê û bi taybet mala yek ji kesayetiyên dewlemend ê Başûrê Kurdistanê, mixabin“Pêşrew Dizeyî”, û çend kes ji malabata wî şehîd bûn û bi 10an kes ên medenî yên din jî birîndar bûn û xisareke gelek zêde ya malî bi welatiyên nêzî wan cihan kevtiye.

Spaha pasdaran a rejîma Îranê li dawî daxuyanuiya xwe de tevî li stugirtina vê êrîşa terorîstî, tolhildan ji bikerên teqîna li bajarê Kirmanê û kuştine çend moreyên xwe li Sûriyê, dike hêcet bo vê êrîşa terorîstî ku bi gotina wan, cihên ku kirine arman, cihê kombûna sîxurên dezgehên sîxurî li dijî Îranê bûye ku navendên fermî yên Hikûmeta Herêma Kurdistanê ew îdiaya spaha pasdaran ret dike.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ku qurbaniyê destê terorîzma rejîma Îslamiya Îranê ye û salek berî niha û li pêvajoya şoreşa “Jîna”yê de binke û bargehên vê ji aliyê spaha pasdaran a rejîmê ve bûne armanc, vê êrîşa terorîstî ya spaha pasdaran bo ser serweriya axa Îraqê û Herêma Kurdistanê şermezar dike û hevdem tevî sersaxîdan bi malbat û kesûkarên şehîdên vê kiryara terorîstî, hêviya başbûna lezgîn a birînên birîndaran dixwaze.

## Rêzdar Mistefa Hîcrî bi boneya canjidestdana sê çiyagerên Kurd peyamek belav kir

Rêzdar Mistefa Hîcrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, li derheq canjidestdana sê çiyagerên Kurd li Nexedê peyamek belav kir

Deqa peyamê wiha ye:

Li gorî nûçeyan, termê sê kes ji girûpek 5 kesî a çiyagera bajarê Nexedê ku li çiyayên Şinoyê kevtibûne bin reniya berfê, bi hewl û tekoşîna tîm û girûpên çiyagerî li bajarên derdor hatine peydakirin û li bin
berfê hatine derxistin.

Canjidestdana wan çiyagerên Kurd cihê daxa hemûya ne
Bi vê bonê ve ez sersaxiya xwe bi malbat û kesûkarên wan ezîzan, tev çiyagerên Kurdistan û xelkê xoşewîst ê Nexedê radigehînim û beşdarê xem û matemîniya wanin.

**Mistefa Hîcrî**

**Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**

**27`ê Befranbara 1402 a Rojîw**



# Daxûyaniya Hizba demokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 78 emîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê

**Hevwelatiyên xoşewîst!**

**Têkoşerên mafxwaz ên Kurdistanê!**

78 salan berî niha, li encama guherînên siyasî yên şerê cîhanê yê Duyem û bi ceribandinvergirtin ji derfetên ku berê ji destçoyî yên pêşya tevgerên Kurdistanê û bi têgihîştina vê demaêye siyasî ya rêberatiya Hizba Demokrat a Kurdistanê, bi taybet "Pêşewa Qazî Mihemed", avabûna Komara Kurdistanê wek yekem desthilata modern a Kurd , li 2 yê Rêbendana 1324 a Rojî beranber bi 22 yê Kanûna duyem a sala 1946 a Zayînî, li meydana "Çarçira" ya bajarê Mihabadê de hate ragihandin.

Armanc û destkeftên bilind û girîng ên Komara Kurdistanê li ser tevgera neteweyî ya Kurd bi giştî, heta niha jî hêvin û keda herî bi nirx û pîroz a civaka Kurdistanê û tevgera wê ya siyasî ya rewa ye. Avakirina Komara Kurdistanê û diyarîkirina sembolên nasnamexwazane yên wek "pêkanîna qewara Komara Kurdistanê, hildana Ala Kurdistanê, damezrandina sipaha netewiya ya Kurdistanê (Pêşmerge), û danana sirûda netewî û gelek destkeft û diyarokên din ên modern, heta niha jî beşeke here qahîm a biciye nasnameya neteweyî ya ax û xelkê Kurdistanê ne. Armancên Komara Kurdistanê ku bidestveanîna maf û azadiyên netewî û demokratîk ên neteweya kurd bi form û şêwaza bi jêhatiye xwe de ye, heta niha jî rênima û rênîşanderê rêvîngên vê rêbazê ne.

Herçiqas ku Komara Kurdistanê li temenekî kurt a 11 heyvan de, bi êrîşa leşkerî ya rejîma paşatî bo ser Kurdistanê dawî pê hate anîn û Serkomarê Kurdistanê "Pêşewa Qazî Mihemed" bi sûçê bicihanîna xwesteka dîrokiye neteweya xwe bi hate sêdaredanê, lê komara Kurdistanê di hizr û zêhna heçî mirovekî azadîxwaz û mafxawz de zindî maye û li pêvajoya xebata bi 10an salan a xelkê Kurdistanê de armancên Komara Kurdistanê, armancên hemî xebatkarekî riya rizgariya welat e.




Em li halekê de yada 78 emîn salroja ragihandina Komara Kurdistanê bi bîr tînin ku, tevgera Kurd li Kurdistana Îranê tevî evê ku negeheştiye armancên komarê, lê gelek qonaxên dijwar û tijî ewraz û nişîv bo vê armanê derbas kirine. Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ku avaker û mîratgirê Komara Kurdistanê ye, tevî taba dehan birînên kûr ên weke, Şehîdbûna bi hezaran kadro û pêşmergeyan di qada berxwedanê li dijî her du sîstemên paşatî û Komara Îslamî, terora rêberên navdar ên wekî Şehîdan "Dr.Qasimlo" û "Dr. Şerefkendî" ji aliyê rejîma Îslamiya îranê, teqandin û mûşekbarankirina binke û bargehên vê Hizbê ji aliyê taqima terorîstî ya spaha pasdaran û gelek birînên din, her wek berê li ser pê xwe maye û cihê hêviya xelkêl Kurdistanê ye.

Li berdewamiya pêvajoya têkoşîna mafxwazaneya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, berferehiya tevgera mafxwaziya xelkê Kurdistanê gorekî Komara Kurdistanê, mewdayekî berfirehtir û girseyî bi xwe ve girtiye, seha nasnamexwaziya netewî, sîvana xwe xistiye bi ser gelek taybetmendiyên din ên edetî yên civaka Kurdistanê û vê yekê ji demên berê zêdetir yekitî di reftarên gelê Kurd çêkiriye.
Niha ku piştî derbasbûna 78 salan li ser ragihandina Komara Kurdistanê, em li rol û bandora vê li qad û texên civaka Kurdistanê di pêşxistina xebata mafxwazaneye gelê xwe dinêrin, em zêdetir ji her demekê seh bi bersivderiya hizr û nêrîna Komara Kurdistanê bo giştgîrbûna vê xebatê dikin. Dema ku çalakvanên navxweyê welat bi pêkanîna yekîtî, rêkxistin û encûmenên curbicur xwe li çarçoveya tevgera berfireh a tevgêra nasnamexwaziyê de xwe erkdar dikin, çêkirina vê xwe bi berpirszanînê li nav qat û texan de ku qalibekî giştî dide vê tevgerê, her wek çavan pêşewayê mezin, bi damezrandina yekîtiya Ciwanan û Jinan ên Kurdistanê, hewla beşdarkirina hemû çîn û qatan li karûbarên siyasî û civakî de dide.
Her wekî li tevgera "Jîna"yê de xûya bû, li qonaxa niha ya tevgera xelkê Kurdistanê de, Asta bilind a hişyariya netewî, rêxistinbûna yekgirtiyane a civakê, reftarên watedar ên van rojan, beşdarbûna piraniya qad û texên civakê li çarçoveya reftarên giştî û girseyî de, xwedûrxistin ji kiryarên tundajo û berçavtengane, cihgirtina Hizbatî û baweriya gel bi hizbanan, zêdetirbûna şiyana civakê li hember her hizir û raman û siyasetên dijegeliyane a deshilata navendgera, ew pîvan û taybetmendî ne ku didin selimandin, Kurdistan di guherînên siyasî û civakî yên Îranê de xwedî pêgeh, peyam û rola taybet bi xwe ye.
Komara Îslamî ya Îranê ku niha û li encama 45 sal zordarî, dîktatorî û binpêkirina maf û azadiyên gelên Îranê û girtina pêşexweye siyaseta şerxwaz a "hinardekirina şoreşê", li asta navxwe û navnetewî de yek ji qirêjtirîn desthilata serdem e, mixabin bi hegerên curbicur û, ji hemûyan girîngtir nebûna alternatîveke bersivder ku bikaribe baweriya gelên Îranê bi dest bixe, sîbera vê ya biyom bi ser xelkê û welat de maye. Lê ji kesê veşartî nîne ku berdewamiya vê xwesepandinê, ne li pêgeh û rewatî yê ye û ne jî nîşana teslîmbûna gelên azadîxwaz ên Îranê ye. Her wekî li nûtirîn serhildana berfireh a "Jin, jiyan, Azadî" civatên xelkê Îranê û netewan danê xûyakirin, tevgera nerazêtiya xelkê li dijî tewawiyeta wê rejîmê ji her demê bihêztir e û roj nîne ku şeqamên welat nebin meydana gotina "Ne" bo rejîma Îslamiya Îranê ku li hember de bi destdirêjiya rastersat, Girtin, îşkencekirin, sepandina cezayên giran û bidarvekirina xebatkarên nên, bersiva wan dide.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, wekî hemû caran, bi giringêdan bi derfeta rastîn a xebatê li navxweyê welat li dijî komara îslamiya Îranê, cehdkirin bo pêkanîna yekîtî û yekgirtina di navbera pêkhateyên cuda, xebat bo çêkirina hevhelwîstî li navbera Opozîsiona pêşkevtinxwaza Kur û Îranî li navxwe û derveyê welat, li pêgeha avakerê Komara Kurdistanê û mîratgirê vê destkevta dîrokî û netewî de, wek hertim xwe bo bidestveanîna armancên Komara Kurdistanê û berdewamî û berfirehtirkirina tevgera Kurdistanê bi berpirsyar dizane.
Li bi bîranîna 78 Saleya ragihandina Komara Kurdistanê de, em pîrozbahiyê li gelê civatên xelkê Kurdistanê û tev mafxwazên riya rizgariya Îran û Kurdistanê ji dîktatoriyê, silavan dişînin bo avakerên Komara Kurdistanê, li serveyî hemiyan Serkomarê Kurdistan, Şehîd Pêşewa Qazî Mihemed.

**Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Navanda Birêveberî**
**Rêbendana 1402 a Rojî**
**Kanûna duyena 2024 a Zayînî**

# Derfeta zêrîn



**N. Aso Mênberî**
**W. Hesen Mukerem**



Roja 2ê Rêbendana îsal 78emîn salvegera damezrandina Komara Kurdistanê tê pîrozkirin Komarek ku tevî kêmiya temenê wê û şehîdkirina wê ji aliyê desthilata Pehlewî ve, lê ji bo paşerojê tijî li dahênan û ezmûn bû.

Gelek caran behsa destkevtên Komara Kurdistanê hatiye kirin û ji aliyên cuda ve hatine nirxandin, ji ber ku helbet kariye bibe bingehek ji bo mifah wergirtin bo paşeroja Kurdistanê.

Hûrbûn li destkevtên Komara Kurdistanê, tevî kêm ezmûniya wê deshilata siyasî, vê yekê nîşan dide ku eger desthilata siyasî li Kurdistanê berdewam bibûya û neketibûya xefika desthilata serdest, bê guman dê rewşa me weke Kurd gelek baştir bibûya.

**Yek ji girîngtirîn xalên ku gelek caran behsa wê hatiye kirin, vekirina deriyê beşdariya jinan di karûbarên siyasî de di çarçoveya Komara Kurdistanê de ye.Komara Kurdistanê weke hêzeke siyasî li Kurdistanê bi awayeke fermî jin anî qada siyasetê.**

Helbet damezrandina Komara Kurdistanê bi xwe weke desthilatdariyeke serbixwe bi qasî ku bandor li ser civaka Kurd û pirsgirêka Kurd li Kurdistanê kir, ev qasî jî bandor li ser jinan û pirsgirêka jinê kir.

Gelek caran hatiye gotin ku Pêşewa Qazî Mihemed wek serkomarê Kurdistanê gava yekem ji bo tevlîkirina jinan di karûbarên siyasî de avêt û hevjîna xwe anî nav siyasetê û hevjîna xwe Mîna wek sekirtêra yekem a vê rêxistinê destnîşan kir, dikarin bêjin ku bihêtrîn pêngav bû di vê serdemê de bo beşadariya jinan di karûbarên siyasî de ku tê avêtin.

Dibe ku ev yek ji gelek kesan re asayî xuya bike, lê bi berçavgirtina rewşa civaka Kurdistanê ya wê demê, ku ji sedî 90ê xelkê wê nexwendewar bûn û asta xwendin û nivîsandina jinan ji ber sedemên cuda gelek kêmtir bû.

Çêkirina hebûna baweriyê di nav jinan de ji bo beşdarbûna di xebatên siyasî û rêxistinî de pir girîng e.

Di civakekê de ku jin weke zayendeke lawaz û heta ji mafê perwerdehiyê bêpar tê dîtin, ev cure baldarî û derfet ji bo jinan gelek girîng e.

Ji aliyê din wêrekiya jinên ku tevî hemû astengiyan jî di çarçoveya xebatên rêxistinî de xwe dîtine û ji vê derfeta zêrîn mifah werdigirin, cihê nirx dayînê ye.

Bilî vê yekê ku jidayikbûna Komara Kurdistanê bandor li ser hestên nîştimanperwerî û neteweperestiya gelê Kurd kiriye û ev hezkirin nifş bi nifş hatiye veguhastin.

Ezmûn wergirtin ji ezimûnên komarê û çend qat zêdetir girîngî bê dayîn, jin ketin qadeke nû û nenas, lê gava yekem bi serkeftî avêtin û kevirê bingehîn ji bo xebata rêxistinî û beşdariya jinên Kurdistanê ji bo pêşerojê danî.

Wêrekiya wan ji nifşên paşerojê re derbas bû û ji bilî ku Yekîtiya Jinên Demokrat weke destkevteke binirx a vê desthilata siyasî hate dîtin, hebûna jinan di karên siyasî û rêxistinî de çend qat girîngî hebû.
Piştî derbasbûna 78 salan li ser damezrandina Komara Kurdistanê, û bi mifah wergirtin ji wan ezmûnan, jin û keçan karîn serkevtinên mezin di karûbarên rêxistinî û siyasî de bi dest bixin û di gelek waran de bibin xwedî helwest û gotina xwe.

**Helbet piştî derbasbûna 78 salan li ser damezrandina Komara Kurdistanê, em nikarin behsa girîngiya beşdariya jinan di karûbarên siyasî de bikin, û nikarin rol û bandora Komara Kurdistanê û damezrandina Yekîtiya Jinan jî berçav negirin.**

Ezmûnên têkoşîna jinan di heyama salên derbasbûyî de, ji me re vedibêje ku Komara Kurdistanê bi xwe ji bo jinan çiqas bûye firsendeke zêrîn.

Di heyama salên derbasbûyî de xebata rêxistinî di civaka Kurd de reng û sîmayek din bi xwe ve dîtiye. Bi rastî jî di qonaxekê de derketina NGO û rêxistinan weke dubarekirina dîrokê bû, Ji ber ku yekser piştî rûxandina komarê û piştre jî bi hatina serkar a desthilata Îslamî ya Îranê, hemû derfetên beşdarbûna di vê listikê de Ji van hat standin, lê derbasbûyîya gelê Kurd di serxwebûn û vebûna Komara Kurdistanê de, wisa kir ku Kurdistan, ne wek deverên din, girîngiyê bide xebatên rêxistinî yên di bin siya partiyên siyasî de û di vê çarçoveyê de, rola jinê di pêşkevtin û serkevtina civakê û rêkxistinî de, bi taybetî jî rol û erka ku jinan di vê çarçoveyê de girtiye bera xwe, rasterast bi paşeroja diyarker a Komara Kurdistanê ve girêdayî ye.

Girîngî dan bi jinê û berpirsyariya wê ya di mijarên girîng de, domandina têkoşîna jinê kir qonaxa şoreşa Jîna yê û jin li ser bingeha ezmûn û destkevtiyên komarê ne tenê aktor, di heman demê de bûn pêşengên sereke di çarçoveya vê şoreşê de.

Erk wergirtina jinan di serdema Komara Kurdistanê de girîng bû, lê parastina van destkevtan ji bo avakirina paşerojeke geş girîngtir e, helbet hebûna jinan û beşdariya çalak di avakirina hêza siyasî ya paşeroja vê komarê de bandora xwe nîşan bide.

Ji ber vê jî divê jin ji bo bidestxistina pêgeheke bihêz hewlên xwe zêdetir bidin û ezmûnên berê bikar bînin û di avakirina paşeroja Kurdistanê de bi berpirsyarî rabin û derfetên xwe yên zêrîn ên niha ji dest nedin.

# Nemana rêjîma Îranê ewlehiya Rojhilata Navîn ewle dike



**N. Azad Kurdî**



Di hejmara berê ya Agirî de me bi hûrî basa têkdana ewlehiya herêma Rojhilata Navîn ji aliyê rêjîma terorîstperwer a Îranê kir.

Hêrişa dubare a rêjîma Îranê ya mûşekên dûravêj û dronên bomrêjkirî ya 15'ê Janvier 2024'an bo ser Herêma Kurdistanê careke din ev yek selimand ku têkdan û destverdan di nav kar û barên Rojhilata Navîn de stiratêjiyeke vê rêjîmê ye.

**Ji sala 2022'an ve, Îranê çendîn caran bi hêcetên cuda û bê bingeh jehra xwe ya dujminkarane bi Herêma Kurdistanê rijandiye. Lê ji sala borî ve heta niha ev hêriş ji hêla rêjîma Îranê û kom û grupên Şîe yên Iraqî yên nêzîk bi vê rêjîmê ve bi awayekî berçav zêde bûne.**

Rêjîmê çend caran bi mûşek û dronan hêrişên terorîstî kir ser partiyên Rojhilata Kurdistanê. Lê bi vê yekê nesekinî û bi dehan caran jî dem û dezgehên fermî û civaka sivîl li Herêma Kurdistanê û binkeyên hêzên navdewletî yên li dijî DAIŞê li Kurdistanê kirin armanc.

**Rêjîm bingeha ewlehî û aboriya ber bi pêş a herêmê dike armanc ku di van du waran de Kurdistan gelek pêş ketiye.**

Ji bo rêjîma Îranê, hebûna Herêmeke Kurdistanê ya bihêz, xwedî aboriyeke pêşketî û ewlehiyeke misoger weke kelmê nav çavên xwe dibîne û jê re nayê qebûlkirin.

Ji ber ku ev rêjîm ligel dagîrkerên din ên Kurdistanê nikarin pêşveçûna Kurdan bi çavên xwe bibînin.

**Gerna hêceta hebûna binke û hebûna hêzên Îsraîlî tenê hêceteke bê bingeh in. Ew baş baş nav û nîşanê Îsraîlê dizanin, lê qet newêrin rasterast hêrişê bikin ser Îsraîlê.**

Ligel ku Îsraîl rojane çekdarên terorîst ên Sipaha Quds li Sûriyê dike armanc û dikuje.

Darêjerên van stiratêjiyên rêjîmê li Tehranê bi awayekê hêrişan li ser Kurdistanê organîze dikin ku bi pasavên bi wî awayî dixwazin rewayiyê bidin van hêrişên xwe yên terorîstî û Kurdistanê jî li hember helwêst û kiryarên micid, xwe bi pasavanînan mijûl bikin û tenê bikevin rewşa berevaniyê, ji hemûyê girîngtir jî Herêma Kurdistanê neçar bikin pasavan bînin li hember van hêrişan û biselimînin ku ev hêriş û tomet bê bingeh in û ev ciyên ku tên bombebarankirin, Îsraîlî namînin !

Lewma divê desthilatdarên Herêmê vê stiratêjiya rêjîma Îranê bixwînin !

Ligel ku di hêrişa çend mehên borî de derkevt ku mal û ciyên ku hatibûn mûşekbarankiirn û rastî dronên bomberîjkirî bibûn, ciyên sivîl bûn, lê Iraqê bi kiryar çi pêngavek li dijî Iranê hilnegirt.
Ev hêriş bi awayekê jî bi keyfa beşek ji hêzên siyasî yên desthilatdar ên Iraqî ne ku agenda û planên Îranê li Iraqê bi başî cîbicî dikin.

Ji hemûyê xirabtir û ecêbtir helwêsta hikûmeta federal a Iraqê piştî van hêrişan cihê baldanê ye.

Ligel ku rêjîmên Îran û Turkiye rojane serweriya Iraqê binpê dikin bi hêcetên cuda û bi armancên dujmikarane li dijî Kurdistanê, lê Iraq tenê bi daxuyaniyên şermezarkirinê razî bûye û bi kiryar çi karek nekiriye li dijî wan binpêkariyan.

Rêjîma Îranê penceşêra Rojhilata Navîn e.
Bi neman û ji navçûna vê rêjîma hov û têkder Rojhilata Navîn ewlehî aştiyê dê bi xwe ve bibîne.



# Kurd neteweyekî mirovhez qencîxwaz, aştîhez e.



**N. Kofîxwar**
W. HESEN MUKEREM

Ne tenê di edet û resman de, di olên kurdan de jî dîyar e ku kurd neteweyekî dilpak û dilovan e, tim û tim hem ji bo neteweya xwe, hem li sersanserê cihanê bona her neteweyan heman tiştî dixwazin ku bo xwe dixwazin wek :Aştî aramî, wekhevî, azadî!. Li hemberê gelên din tim û tim di wan hizra de ne. Xwedî hest û hizrên baş di olên kurdan Zerdeştî, Êzidîtî, Yaresan(Ehlî Heq) û yên berî wan de diyar e. Diyar e tu fermaneka êrişa li ser welat, hûner, çand, rûmeta gelên din ferz kirinê nîn e.

Tu carî nêzikî ew fikrên nebaş, xerabî nebûne. Tenê li dijî êrîş û dagirkeriyê berevaniya axa xwe û rûmeta xwe şerê xweparastinê kirine.

Tu carî destên xwe direjî li ser jin û zarên dijminan nekirine, bi dijminê xwe re bi mêranî, insanî şer kirine.

Lê mixabin li hemberê xwe tu carî ev fikrên baş, pak, rast neditîne, her û her bi êrîşê, dijmintayî, jînosaîdê ve rû bi rû mane. Em dikarin bibêjin dema İskenderê Meqdonî vir dedibe ku ji vê kevintir e jî- êrîşên pir alî yên berdewam li ser kurdan hatiye kirin. Çanda kurdan, hunera kurdan, welatê kurdan dizîne bûne xweyî ax, çand, ziman û dîrok.

Kurd kuştine, Wekî Helbece, Kurdistana jorîn ya Sor, wek Efrîna delal ya Rojavayê kurdistanê, Kurd ji welatên wan ê qedîm derxistine, bê ax hiştine.

Bi ser de kurd sûcdar kirine, çima ku Kurd xwediyê ax, ziman, dîrok, çandeka zengîn in. Di vê çekama(beyt) jêrîn de qala êrîşeke bi wî awayî dike, ya bi destên erebên hov hatiye kirin, ya bi navê , Hurmizgan, lê kirine binêrin. Da ku ji berê de heta îro neyarên kurdan, ku roja îroyîn bêhtir Kurdên Bakûrê Kurdistanê heyranê ol, çand û zimanên wan in çî anîne li serê kurdan:

Di sala 1909 de vekolînên li gundê Hezarmerdê yê bajarê Silemaniyê li ser çermekî kevin bi xetên Pehlewî hatiye nivîsîn, weha dibêje:
Hurmizgan riman, atiran kujan(Agirê Hurmizgehan temirandin)
wêşan şardewe gewre gewrekan(mezin û gire giran xwe veşartin)
zorkar areb kirdine xapur(Zordarên Ereb kirin wêran û kavil)
ginay palle heta şarezûr(Hemû gund heta şarezûr)
jin û kenîkan wedîl bişîna(bi dilî hatin girtin jin û keçikan)
mêrd aza telîwe ruy xwêna(mêren çeleng di nav xwînê de hiştin)
rewişt Zerdeşt manewe bêkes(Bêkes ma rê rêça ola zerdeşt)
bezeyîka naka Hurmiz wehîç kes.(dilê Hurmiz tu kesekî neşewitî)

**Mixabin heta niha helwesta wan a li dijî kurdan nehatiye guhertin. Dijminên kurdan wek berê ne. Lê yên ku her carê ji dîrokê şiretan vernagirin kurd in. Çima ku însanên dilpak in, zû ji bîr dikin, naxwazin bi dijmintayî tevbigerin. Ji ber ku yên li hemberî kurdan wek kurdan nahizirin, tim û tim kurdan ji bo xwe dijminên sereke dibînin. Li vê dijmintayê jî carnan bi aşkere dîyar nekirine. Tu carî li ser soza xwe nesekinîne.**

Bi deq û dolaban, bi buxdanan ve bi ser ketine. Li gorî hişyardayîna dîrokê sedemên sereke yên bi ser ketina dijiminan, safiya û pakdiliya kurdan e. Dilpakî, insanetî tiştên baş in, lê mixabin ev dilpakiya kurdan li hemberî kurdan dibe zerardayîneke mezin, wek tîrên tûj didaçikilin ser dilê kurdan, pişta kurdan dişêkînin. Li hemberî her kesî (dijmin jî bi tev de)dostanî tevgeriyane û tevdigerin. Lê divê kurd bi tenê li hemberî însanan însanî tevbigerin ne li hemberî dijminan. “Dijminên bav û kalan nabin dostên lawan”.

Dîsa dilpakiya kurdan beşeke ji ola Zerdeştiyê weha tînin ziman “di dawiyê de arezûya Zerdeşt ew e,ku xwestek û daxwaza duristkirdaran ku ew jî avedaniya cihanê ye, yanî nû kirina cihanê saz bikin, Da ku hemû mirov bextewer û rizgar bibin. Bêguman daxwaza herî a duristkirdaran, dabinkirina aştî, biratî, wekhevî, pêşkeftina cihanê ye.”



Di ola Yarsanan de jî ku hema wekî Ezîdîtî, Zerdeştiyê ye, dilpakî û diristbûna mirovan weha derbas dibe, her wekî ku pirtûkên dînê yên Yarsaniyê jî tê fahmkirin tenê giyanên qencan dikare ser pira Perdiwerê (Ji Avestayê ‘ çinwet’, kurdiya Pehlewî ‘ çinûr’ zimanê aramî ‘sirat’) derbas bibe û biçe behiştê.

**Giyanên nepakan nikare bi ser pirê re derbas bibe, ew ên herin dozexa kiryarên xwe yên qirêj. Di her beşan de Olên kurdan yên kevnare qala mirovatiyê, qenciyê, rastiyê dikin. Ji ber wê jî Xwedevanên kurd dostane ne. Mirov ne ji ber metirsiyê, belku ji ber hezkirinê li wan bawer dikin.**

Bir û baweriya kurdan, hişmendî û rê û resmên kurdan jiyaneka hevpar nîşan dide wekî li vê jêgirtiyê de “Basimbar, deziyekî (benê zirav) ji rengên spî û sor tê çêkirin, Wekî sembola di diroka 25ê Adarê de li gorî salnameya rojhilat li destan tê girêdan.

Rengê spî sembola aştî, hezkirin, biratî, dilpaqijiyê ye. Rengê sor sembola xwîna paqij û zelal e.”

**Bawer bikin ev şiretên başî û pakiyê yên zelaliya dil, di olên dawî yên yekxwedaperstî de ewqas her carê tê dubare kirin nîn in. Ji ber wê hegerê cîhan li gorî bîr û baweriya kurdan ji nû ve saz bibe, bi rêve biçe hewce namîne bi ideoljiyên çêkirî. Li nav cîhanê jî wek şer, pevçûn, birçîbûn hwd tu pirsgirêk namîne. Lê berî her tiştî kurd hêza xwe ji bo Kurdistaneka serbixwe bi kar bîne. Bi hêviya serkeftinê!**



# Jin û hilbijartin



**N. Vênûs Fayîq**
**W. Hesen Mukerem**



Ji roja ku jin ji dayîk bûye heta niha gelek bijarde xistine berahîka wê, herçend ku ev hilbijartin li gorî serdemê guherînkarî bi ser de hatiye, lê prensîba hilbijartinê bi xwe weke felsefeya diyarkirina çarenivîsa jinê maye.

Herçawan di destpêkê de hilbijartin nebûye, belkû sepandin û destnîşankirina jiyanê bûye, lê jinê ev hilbijardeyek li hizra xwe dîtiye ji ku weke bijardeya domandina jiyana xwe di gel zayenda dijber de.

Di roja îroyîn de li ber çavê zayenda berevajî divê jin yan dayîk be yan nivîskar be, yan jineke guhdar be yan jî çalakvan be, yan jî siyasetmedar be yan jina malê baş be yan jî helbestvan be yan jî tenê helbestan bixwîn e.

An jî çalakvaneke siyasî ya serhişk û têkoşer ku bi dehan pirsgirêkan re rû bi rû maye, di nav wan de heqaret an kulikek ji bo xemilandina partiya xwe, an alîgirê partiyek ku ji hêla zilamên malbata wê ve hatiye destnîşankirin an jî bêdengiyê hildibijêre û ... hwd.

**Pirsgirêk ne hilbijartinên ku ji jinan re têne pêşkêş kirin, prensîba hilbijartinê bixwe ye ku divê jin red bike û dereqeta wan bê. Ger civak di esasê xwe de civakeke mirovî be ku li ser bingehên edalet û wekheviyê hatibe avakirin, jin jî mîna zilaman dikarin van hemû rolan bilîzin.**

**Civakek ku di hemû waran de bawermend be bi şiyana jinê, dûrî nêrîna gemar ku jin tenê di metbexê de û di nav nivînan de tê qebûlkirin. Yanî civakê diyar kiriye ku divê jin çi be, bi hejmarek peyvên din civakê bo jinê biryar standiye ku, jin çi be û eger wisa nebe wiha jin canlibereke nefretkirî û red kiriye.**

Ji ber ku di civaka me de hilbijartin ji jinan re nayê dayîn, lê rewşeke ku li ser wan tê sepandin. Ev tê wateya bêparkirina mafê azadiya takekesî, mafê redkirinê û mafê biryardanê.

Prensîba bijartinê ya ku civak jin bindest û stû xwar dike, hewldanek e ji bo sînordarkirina şiyanên jinan û stû xwarkirina jinê bi zagonên civakî ya standard ku mêran hêlên sereke wê re xêz kirine û jinê ji îradeya wê dixîn.

Helbet ev yek di gelek warên din ên weke pîşeyî û zanistî û ... hwd de xwe nîşan dide. Ev bi serê xwe li dijî hemû zagonên azadiyê ye, bi taybetî jî azadiya hilbijartina jiyaneke kêrhatî ji xwe re weke jineke ku biryara yekemîn e, ne mêr e.



## Nerîna Lîderan



**“Mes`ûd Barzanî”:**

“Mes`ûd Barzanî: Êrîşên bi vî rengî îradeya gelê Kurd naşkênin, wê xurtir bikin.”



**“Hoşyar Zêbarî”:**

“Hoşyar Zêbarî: Eniya Berxwedana Iraqê herêmê ber bi şerekî berfireh ve dibe”



**“Muhammed Şîya El-Sûdanî” :**

**“Muhammed Şîya El-Sûdanî: Ev bûyer rûdaneke metirsîdare û kêşeyan ji bo peywendiyên bihêz di navbera Iraq û Îranê de çêdike.”**



**“Abram Paley”:**

**“** Rejîma Tehranê bi awayekî aktîf ne aramiyê li herêmê çêdike”

## Jin, Jiyan Azadî, destpêka yekemîn şoreşa Jinan ji bo rizgariya Kurdistanê li dijî sîstêma mêrsalar a Îranê!



**N. Eskender Ceiferî**

Xebata mezin ya li dijî gemartirîn dîktatorê ser rûyê erdê, ji bo rizgariya yekcarî li Kurdistanê bi destên keç û jinên Kurd dest pêkir. Jîna Emînî, destpêkera vê şoreşê bû ku di asta cîhanê de weke yekemîn serhildana jinan ji bo rizgariyê tê binavkirin.

Jîna Emînî keça Kurd a xelka Seqizê li Rojhilatê Kurdistanê bû. Ew di havîna sala 2022 de li bajarê Tehranê rastî êrîşa hêzên polîs ên bi nav parêzvanên exlaq ve hate girtin. Sedema girtina wê ev bû ku weke hêzên rêjîma Îranê digotin, hinek ji pora wê xûya bû û bi wî awayî jî, bingeha yasayên Îranî rastî gefê dihatin! Ew dibêjin mafên keç û jinan nîn e bê hebûna hîcabê ji malê derkevin. Lewma Jîna Emînî li wir hate girtin.

Tevî ku wê di dema girtinê de got ku ew xelkê Tehranê nîn e û ji bo serdanê hatiye wir, lê belê bi awayekî hovane li wir rastî lêdanê hat. Di encamê de jî ew ji bo heyama çend rojan kete nav komayê.
Pişt re duktoran ragihand ku Jîna yê li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest daye.
Bi belevbûna nûçeya mirina Jînayê, li Seqizê ku bajarekî parêzgeha Sine li Rojhilatê Kurdistanê û cihê jidayîkbûna Jînayê bû, serhildaneke mezin li dijî rêjîma Îranê dest pê kir.
Termê Jînayê ji bo wir hate veguhestin û bi hezaran welatiyan ji nawçeyên cuda yên Kurdistanê bera xwe dane Seqizê.
Li wir ev bi axê hate spartin lê hizr û ramana wê ji bo rizgariyê bû destpêka şoreş û serhildanekê ku weke Serhildana Jînayê, Şoreşa Jînayê û herwisa weke Şoreşa Jin, Jiyan, Azadî jî tê binavkirin.

Mezintirîn slogan yan jî diruşma vê serhildanê heman Jin, Jiyan, Azadî ye. Partiyên Kurdî jî wê demê daxûyanî dan û ji xelkê Kurdistanê xwastin ji bo nîşandana nerazîtiya xwe li hemberî siyasetên mirovkujane yên rêjîmê, bikevin gireva giştî. Xelkê Kurdistanê jî kete girevê. Ji bo heyama zêdetirî 10 rojan ti dikanek li Kurdistanê vekirî nebû.
Li wir xûya bû ku rewatiya rêjîma da-



girkar li Kurdistanê çiqasî ye?!
Bi gefxwarin, girtin û îşkenceyê jî rêjîmê nekarî xelkê Kurdistanê neçar bike ku dawî li gireva xwe ya giştî bînin. Girevek ku bi destpêşxeriya jinan li Kurdistanê dest pê kir û piştre gihaye Erebistan (Ehwaz), Belûçistan, Azerbaycan, Luristan û nav Farsan jî.
Slogana Jin, Jiyan, Azadî gelek zû bû giştgir û li hemû kolanên Îranê li dijî rêjîmê dihat hildan.
Xelkê Kurdistanê û hemû nawçeyên din jî di serhildanê de berdewam bûn û partiyên Kurdî bi daxuyaniyên xwe, ew rênimûnî dikirin.

Rêjîmê di heyama 4 heyvan de zêdetirî 500 kesan li Kurdistan, Belûçistan, Azerbaycan, di nav Farsan de û li Ehwaz yan Erebistanê kuştin, Serhildêran navên wan cangoriyên azadiyê danî şehîd û soz dan ku ewê di çepera wan de bimînin.

Rêjîmê fikirî ku take rê ji bo derbasbûn ji vê rewşê, tenê ev e ku êrîşê bike ser partiyên Kurdî yên ku navendên wan li Başûrê Kurdistanê ne. Di encama çendîn êrîşan de ji bo ser Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê PDKÎ, Komelle yan jî partiya Komonîst a Kurdistanê û herwisa ji bo ser Partiya Azadiya Kurdistanê PAK herî kêm 40 kes hatin şehîdkirin ku biçûktirînê wan, zarokekî sava bû ku hêla li zikê diya xwe de bû ku nav lê danîn Vaniyar ku di encama vê êrîşa bi mûşekan de diya wî birîndar bû ji bo nexweşxaneya bajarê Koyê hate veguhestin, li wir diya wî jiyana xwe ji dest da. Ew ji dayîk bû û piştî rojekê ew jî tevlî karwanê cangoriyên şoreşa Jînayê bû.

Hevdem li navxwe jî bi hezaran kes ji aliyê rêjîma Îranê ve hatin girtin. Her û her ew serhildan gurtir dibû û li dervey welat jî rêjîma Îranê hewl da diruşm yan jî sloganeke mêrsalarî bi navê Mêr, Welat, Avedanî çê bike.

Piştî ku ew slogan li hin ciyan li Ewropa û Amerîkayê di nav xwepêşandanên ji bo piştevaniya serhildana Jînayê de hatin hildan, û Riza Pehlewî kurê dîktatorê berê jî hewl da bêje ku ew rêberê vê serhildanê ye û ev serhildan ne serhildana jinane, belku serhildaneke Îranî û nasyonalîstî ye, xelkê navxwe hinek sist bû. Ji ber ku xelk ne sîstêmeke mêrsalar û ne jî nasyonalêsta navendgera dixwaze.
Tevî ku niha piştî sal û nîvekê serhildan hinek sist bûye û xwepêşandanên navxwe weke berê nemane, lê belê li navçeyên cuda bi awayên curbicur, şoreş li dijî rêjîma Îranê berdewam dike.



# Heya kengê dê her wisa zilm li ser gel bidome?





N. Jêhat

Kurd û Kurdistan weke êtîmên bê xwedî û bê sergêr, kê radibe tep û li nav serî dide, kes dengê Kurdan nabihîse, civatgeha cîhana pêşkevtî, saziyên ku kevrê berevaniya mafê microvan li sîngê xwe didin, dewletên bi qawete ku behsa dijayetiya dîktatoran dikin, hêz û aliyên ku xwe alîgirên mafê microvan û demokrasiyê dizanin, alî û dewletên ku wiha didne xûyakirin ku di cehda çêkirina ewlehî û asayîş û aramiyê didin, û zilhêzên ku xwe xwediyê parastina keramet û jiyana microvan û bindestan dizanin, her hemî li pêxema berjewendî û stratejiya xwe de dixebitin û ya din her hemî ji dirûşmekê zêdetir nine.
Ger ev dirurişm nebin, xu ber çavê xwe dibînin çawan roja rohn kuran dikujin û bombebaran dikin û agir bi ser Kurdan de dibarînin, dibînin ku bi çekên herî giran, wek bombebarana ji rêka firokan, mûşekên balêstîk, dironên bombrêjkirî çawan Kurdan kumkuj dikin.

Turkiye ku endamê hevpeymaniya Atlantîka Bakûre û hevalbendê welatên Rojavayî û amerîka ye, ber çavê cîhanê hemî cure çekekê bi ser gelê Kurd de diceribîne, kêm roj heye ku gund û bajarên Rojavayê Kurdistanê neke armanca êrîşa bê rehmane ye xwe, kêm roj heye ku xisarekî mezin negehîne jêr bînaya abûriya rojavayê Kurdistanê, kêm roj heye ku jêrxana Kurdistanê kavil neke û derbê ji iliktirîk, Av, Neft, Gaz, Pire, Nexweşxane, Qutabxanan need.

Gorî zaniyariyan rewşa jiyanê li Rojava yê Kurdistanê gelek dijvare û pir aloz û zehmete, bê îmkanatiya hewcehiyên jiyanê, bihatî, bêkarî, bê avî, bê sixtenî li wê werzê sare zivistanê de û serweyî hemiyê jî nebûna sibat û ewlehiyê û dilequtka ber metirsiya her gave êrîşa ser cane wan, wisa kiriye ku felaket dibare.

Ji her tiştî pitir ku mirov aciz dike, eve ku nebûna yekîtî û yekrêziya di nava part û aliyên siyasiye Kurd deye ku li kerbê hev du de, ne tenê li hember wan êrîşên Turkiyê de bê dengin, belkû wisa lê hatiye ku ti aliyek xwe berpirsyar jî nizanin , ti alî û hêzek xema gelê belengaz û lêqewmiye Kurd de nine.

Pirskirêk û netebayî ya wan partiyan wisa kiriye ku tenanet amade nînin dengê xwe li hember wan êrîşên ser gel bilind bikin û şermezar bikin, bi kurt û kurmancî gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê di navbera ber aş û nal û bizmarê kêşa di navbera part û aliyên siyasiye Kurd de asê maye.

Sazî û aliyên sivîl, tenê bi dana daxûyaniyan dikarin rewşê bînine ziman û dengê nerizayetiya xwe li hember wê rewşê bilind bikin.
Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê, li ser wê rewşa pir dil êş, daxûyaniyek belav kiriye ku deqa wê wihaye:

**DESTDIRÊJIYA TIRKIYÊ JÊRXANA BINGEHÎN Û SAZIYÊN GIŞTÎ ARMANC DIKE**

Careke din ji aliyê hêzên artêşa Tirkiyê ve, êrîşên leşkerî li ser jêrxana bingehîn û saziyên giştî, wekî stasyonên elektrîkê û saziyên neftê û xizmetguzariyê li Parêzgeha Hesekê bi taybetî navendên neft û gazê yên (Siwêdiyê, Rimêlan, Tirbespiyê ...) hatin pêkanîn.

Dewleta Tirkiyê li ser pêkanîna tawanên hovane li dijî gelê me û herêmên me ranewstaye, bi rêya bombebarankirina navendên bingehîn û xizmetguzariyê û eletrikê û navendên sivîlan bi awayekî berdewam, ku êrîşên wê ji havîn û payîza par ve didomînin, ku di çend rojên borî de 80 sazî û dezgehên sivîlan hatine bombebarankirin.

Em wekî Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê, di demê ku em tawanên dagirkeriya Tirkiyê şermezar dikin, hevdem em bang li civaka navdewletî dikin ku êrişên Tirkiyê li ser gelê me û navçeyên me şermezar bike, herwiha em bang li Revenda kurdî li dîasporayê jî dikin ku bi awayekî aştiyane xwepêşandanan li dar bixin bo şermezarkirina tawanên dagirkeriya Tirkiyê, yên bi armanca wêrankirina sîstematîk ya saziyên xizmetguzariyê yên bingehîn û armanckirina bi qest ji bo qirkirina gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê û koçberkirina gelê mayî û jinavbirina pirsa neteweyî ya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê.

**QAMIŞLO 16.01.2024**
**YEKÎTIYA NIVÎSKARÊN KURDISTANA SÛRIYÊ**



# Zewaca di temenê zarokatiyê de



**N.Şîva Xwedabender**
W. HESEN MUKEREM

Zewaca bi darê zorê li Îranê ku gelek caran bi zewacên di temenê biçûk ve girêdayî ye, yek ji mînakên herî diyar ên tundûtîjiya li dijî jin û keçên Îranê ye.
Li gor amarên dawî yên cîhanî, rojane zêdetirî 30 Hezar keç bi darê zorê tên zewicandin.UNICEF kite rêxistin e ku ji bo bidawîkirina zewaca bi zorê ya zarokan têkoşîn dike.

Li gor yasayên navdewletî kesên di bin temenê 18 saliyê de zarok tên naskirin, lê hikûmeta Îslamî maddeya 1041ê ya yasaya peyman û zewacê bi şert û mercên zewacê derxistiye, ku ji wan tê xwestin ku bi destûra welî û dadgehê keç li temenê 13 saliyê û kur jî li temenê 15 salî şonda dikarin bizewic in.

Di gel balkişandin li ser xebatên demdirêj yên bo vêdebirina yasayan, lê hîn jî li sala 1398an a Rojî de, hejmara zewaca keçên 10 salî heta 14 salî ji 32 zewaca giheştiye 53 zewacan. Zewaca zarokan zêdetir li herêmên xizanî pêk tê.

Malbatên ku metirsiya zewaca keçekê di temenê biçûk de ku zewaca li temenê biçûk fêm nake ku demên nurmal derbas dike da ku ji hêla bedenî, ruhî û derûnî ve ji bo zewacê amade be nişkave di gel guherînkariyek wiha rû bi rû dibe, zewaca di temenê biçûk de dibe sebeba pirsgirêkên derûnî yên micid ku bilî encamên wêranker yên weke azarên cinsî ji aliyê zilam ve, metirsiya can jidestdanê ji ber zayîna di temenê biçûk de, dev berdan ji xwendinê, bêwejn man di temenê biçûkatiyê de hene û piraniya zarokên ku ji bo revîn ji zewacê dest didin bi xwekujî û xwe şewtandin ê.

Zewaca di temenê biçûk de ne tenê pirsgirêk e, lê di heman demê de wek ekseneke ji pirsgirêkên civakê ku berfireh dibe.

Zewaca di temenên biçûk de li ser zarok û azardana zarokan ku tên hejmartin, têne hesibandin, divê bi wan re cezayên tawanan bên dayîn.

Zarokên ku dizewicin, hêj di aliyê fikirî û fîzîkî de negihiştine û xav in. Nikare biryara xwe ya der barê pêşeroja jiyana xwe de bidin. Ew kesên ku dikarin zewac û jiyana hevbeş pêk bînin, divê bigihêje têgiha aqilî ,mezinbûna fikirî, aborî, ferhengî ku bikare hilbijartineke baş û rast bike.

Li Rojhilatê Kursistanê van heyamên dawîn, bi awayekî berbiçav, hejmara zewicandina keçan di temenekî biçûk de zêde bûye, di nav civakê de, zarokên keç ên ku di temenekî biçûk de tên zewicandin, weke 'bûkên zarok' tên binavkirin û gelek caran bi kesên ku temenê wan gelek ji yê wan mezintir e re tên zewicandin.

**Li Rojhilat, piraniya malbatan, keçên xwe, bêyî ku bigihijin temenê xwe yê 18 saliyê, dizewicînin ku li gelek welatên cîhanê zewicandina li jêr wî temenî ne yasayî ye. Li gelek welatan jî zewicandina li jêr wî temenî girêdayî destûra dayik û bav e.**

Li gor Peymana Mafên Zarokan ku dewleta Îranê jî ew peyman qebûl kiriye, kesên di bin temenê 18 saliyê de, weke zarok tên qebûlkirin û weke ku bedena wan ji bo zewicandina wan ne amade be, tên qebûlkirin.

Lê jibilî van têbîniyan, kesên di temenê zarokatiyê de tên zewicandin, ji mafê xwe yê xwendinê jî bêpar dimînin.

Sedema sereke ya zewicandinên di temenên biçûk de, rewşa aborî û kevneşopiyên di nav civakê de nîşan didin. Lêbelê li gor xebatkarên mafên zarokan jî siyasetên hikûmetê yên handana zewacên di temenekî biçûk de, weke sedemeke bibandor a zêdebûna rêjeya zewacên bi wî awayî, nîşan didin.

Civaknas sedema zêdebûna bûyerên xweşewitandin, xwekuştin, bikaranîna madeyên hişber û tundutujiya li hemberî jinê li Rojhilatê Kurdistanê, bi vê yekê ve girê didin.




**Projeyasaya têkoşîna li hemberî zewacên di temenê biçûk de, heta niha di parlamentoya Îranê de, çend caran gotûbêj li ser hatine kirin. Lêbelê bi hinceta ku ew projeyasa 'ne li gor rê û rêbazên îslamî' ye, hatiye redkirin.**

Divê şerîa û yasadanerên olî wek mela yên ku vî sûcî, dikin bi şer`I û yasayî û zarokan hay didin bo zewacê, divê ji ber binpêkirina mafên zarokan û mafên mirovan bên darizandin.

Ji bo avakirina civakekê ku zarok di nav aramî û ewlehiyê de bijîn, divê hemû şert û mercên civakî û şer`î û adetên qanûnî yên ku ev zewacên hanê mafdar hesab die, bên rakirin.

Ger rejîm naxwaze wê diyaroka paremayî ji holê rabike, ger rejîm naxwaze mafê Zarokan berçav biger, wê demê erkê xebat bi dijî wî karê qirêj û zewicandina keçan li temenê zarokatiyê de, dikeve ser milê civatgeha Kurdistanê, erkê yekem bo nehêlana wî adetî dikeve ser milê dayîk û bava û malbatê, erkê duyem dikeve ser milê xebatkarên civakî, mamosteyên Olî, jinên xebatkar, çêkirina rewşenbîrî û hişmendiya moderne serdem li nava civaka Kurdistanê de.

**Bê guman dema ku xebatkarên kurd, Partiyên siyasiye kurd, jinên xebatkar û pêşeng û mafxwaz, behsa pêşkevtin û yekîtî û hişmendîya siyasî û netewî dikin, dibe baş bizanin ku zewicandina Zarokan jî yek ji pirskirêk û diyardeyên dûr ji exlak û adetê civakekî pêşkevtiye.**

Bila em hemî dest bidne destê hev bona ji holê rakirina hemî adetên ne rinde nava civatgeha kurdistanê ku yek ji wan zewicandina zarokane.



# Heya niha jî bi kutikê Kawe serê me tê kutan



N. SERBEST URMIYE

Bê guman herkrsîê ji me kêm an zêde bala xwe daye ser helbestên helbestvanê Fars wate Firdosî ku di pirtûka wî ya bi navê "Şahname" de hatine kom kirin.

Di pirtûka han û di derheq Kurdistanê de karakterê sereke ku weke fêris yan lehengekê tê mêzekirin Kawe'yê Asinkut e ku li gorî "Şahname"ê, yê bûye mêrxasek bo doza rizgariya gel û serkewtin bi ser padişaheke zordar weke Zuhak de. Heke mirov hindekê dûrtir û kûrtir ji mijarê bihizire, ya zelal dibe eva ye ku armanceke siyasî û dijî neteweyî li hember gelên herêmê, bi xasmanî gelê Kurd di vê rêbazê de tê şopandin.

Weşandina Pertûkê bi terzekî pirreng û deng, dibe ku du armancên sereke hebin. Veşartina sîstema dagîrkeriyê û guherîna derûnnasiya gel ku destpêka pêvajoya bişavtina neteweyî, çandî û …e. Lewma jî dagîrker ji vê pertûkê him weke alav û belgeya selimandina xwe di herêmê de mifahê werdigire.

Him jî hewil dide ku di rêya efsaneyên pertûkê de derûnnasiya gelan û yek ji wan gelê Kurd biguhere da ku bikare bi hêsanî di pêvajoya tunekirinê de serkewe. Lewre nabe ku Firdosî weke navdareke bê alî di vê derheqê de were bîranîn. Encama lêkolînên nivîskar û dîroknasên Kurd ku di vê gotarê de hatine dikarin vê gotinê bidin selimandin.


Destpêka Pêvajoya tunekirina gelan ya ku bi navê pêvajoya bişavtina neteweyî tê binavkirin, di rastî de bi guherîna saykolojiya gelan dest pê dike. Ev yek jî di serî de di rêya guherîn û alozkirina dîrok û bêrûmetkirina çanda gelan de, rewşekê diafirîne ku gel ji nirx û hêmayên xwe havî bibe û nirx û hêmayên dagîrker wergire. Di daviyê de ji bo serkewtina yekcarî di qonqxa kuştin û qirkirina gelan de derbaz dibe. Firdosî bi taybetî di mijara Newrozê de li herdu nîşanên han dayê. Di heman demê de ku cejna Newrozê ku semboleke çandî û neteweyî ye di herêma Kurdan de, weke cejna serhildanê li dijî desthilata dijî gelî dide xuyakirin, hevdem bi awayekî tejî ji hirs û kîn jî baz dide ser desthilata wê demê ya herêma Mad û rengekî wiha hov dide Padişahê wan ku Kaweyekî mêrxas û leheng ji vê herêmê rabe û gel li bin darê zordariyê rizgar bike. Ew cihê hêma û hebûnan diguhere, bi terzekê ku heya niha jî di nava me de peyda dibin ku şanaziyê bi hêmayên destçêkirî yê dagîrker, bi taybetî karakterê sextê yê bi navê Kawe yê Asinkut ve dikin.

**Kawe yê Asinkut, li gor çi ramaneke zanistî hebûna wî nehatiye selimandin û li gor hemû belgeyên zanistî yên ku heta niha dest dîroknasên Kurd ketine, ji bilî karaktereke xeyalî tiştek din bi navê Kawe nahê dîtin, ne Kurd e û heke hebe jî, karakterê xeyanetê ye li gelê Kurd .**

Ji bo selimandina vê gotinê hewil hatiye dan ku çavkaniyên dîrokî yên zanistî ku li ser destê dîroknasên Kurd weke pirofsor dr. Keywan Azad Enver, lêkolînvan, dîroknas û mamostayê dîrokê yê zanîngehên Herêma Kurdistanê û herwiha Dr. Mewlûd Îbrahîm Hesen, Pisporê dîrok û mîtolojiya kurdan û mamostayê zanînhehên Kurdistanê, mifah were wergirtin.

Dr. Keywan Azad Enver di pertûka xwe ya bi navê" Kurd û mêjoyî cejnî Mewroz" wate Kurd û dîroka cejna Newrozê de, wiha tîne ku:

1. **Firdosî ku fars û Îranî ye, ne dîroknas, belkû helbestvan bû û eşkere ye ku hin ji helbestvanan bûyer û çîrok mezin kirine û bi awayekî xeyalî berhev kirine.**
2. **Ji aliyê zanistî ve dîroka mirovahiyê nedaye xuyakirin ku mar li ser milên mirovan derketibin, weke ku Firdosî dibêje ku du mar li ser milên Zuhak derketine. Eger li şûna maran jî, kulikek ji goştê jehrî jî derketibe, li gorî pîvanên zanistî, mêjiyê mirov ji bo dermankirina nexweşiyan nehatiye bikaranîn. Lewra ev îdiaya Firdosî, dûr e ji rastiyê.**





Li gor destkewtên zanistî yên Prifsor Keywan Azad Enwer, şaşîtî û tawaneke mezin e ku mirovê Kurd şanaziyê bi karaktereke weke Kawe bike ku ne Kurd bûye. Ew heke hebe Fars û damezirînerê desthilata Hexamenişî piştî hilweşandina desthilata Kurdî anku Mad bûye.

Di heman demê de jî Dr. Mewlûd Îbrahîm Hesen, di pirtûka xwe ya bi navê " Newrozî Kurd" wate Newroza Kurdan de, bi tundî li hember " Firdosî" disekine û wiha dibeje ku nivîskarê "Şahname" ya Farsî, Newrozê li gor efsaneyeke bê bingeh wate efsaneya Kawe û Zuhak, bas dike ku tu esaseke dîrokî jê re nahê dîtin.

**Rast e ku Zuhak yan Astiyag, dawî padişahê Mad bûye, lê ya ku "Firdosî" hewil dide wî weke miroveke xwînmij bide naskirin ku cotek maran li ser milê wî bûne û diviya ku hemû rojan mejiyê du xortan bixwarina, dûr e ji rastiyê û tu bingeheke zanistî û rastiyeke dîrokî jê re nehatine dîtin.**

Li gor baweriya Dr. Mewlûd Îbrahîm Hesen, gehiştina taqimeke Farsan bi desthilatê, piştî serkewtina Hexamenişiyan û hilweşandina desthilata Kurdî bû sedem ku kevneperestên Fars bi giştî û " Firdosî" bi taybetî desthavêjin vehûnana efsaneyên wiha bê esas, heya ku rûmeta gelê kurd weke dijminê sereke li hember wan pê şêlû bikin, ya ku me berê gout ku destpêka rêya bişavtina neteweyî ye.

Dirêjbûn û nûjenkirina pêvajoya bişavtina neteweyî di qoanxên cuda de, bandoreke evqas giran di Kurdistanê de daniye ku heya niha jî serbarê darvekirin û tunekirina bi sedan kesên xwefiroş li ser destê dagîrker bixwe, lê hêj zaf in yên ku çeperên dagîrker hilbijartine û di hember tunekirina gelê xwe de şanaziyê bi kesayetiyên rejîmên dagîrker dikin. Serbarê hebûna rêberên zane û bilîmet û bi hezaran mêrxasên Kurd di bizava rizgarîxwaziya Kurdistanê de, destên ku bi hezaran Kurd qirkirine, tên ramûsîn û terorîsteke weke Qasim Silêmanî weke leheng û rizgarîxwaz tê bîranîn.

Bila rastiyên han, me haydar bikin ku em rastiyên dîrokî û neteweyî yên xwe bişopînin, da ku çi caran em dest ji biha û nirxên xwe bernedin û şanaziyê bi xizmetkariya dagîrkeran nekin. Ya herî daviyê ku ji gelê me re eşkere ye û heya niha jî bi caran nimûneyên vê bi çavên xwe dîtine, berhema xizmet kirinê bi rejîmên dagîrker e ku ji bilî poşmaniyê tiştek din nebûye.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Birîndarbûna 5 kolberên Kurd li ser sînorê Bane û Newsûdê



Pênc kolber ku nasnameya çar kes ji wan yên bi navên Cewher Muradî, Hemîd Ehmedî, Îdrîs Îsmaîlî û Yehya Navbang nediyar hatine eşkerekirin li sînorên Bane û Newsûdê bi teqeya hêzên çekdare rejîma Îranê hatine birîndarkirin.

Li gorî nûçeya Rêkxirawa Mafê Mirovî ya Hengawê, roja Çarşemî 27ê Befranbarê kolberek bi teqeya rastewxwe a hêzên çekdare rejîmê li ser sînorê Newsûdê hate birîndarkirin.

Berê jî anku roja Sêşemî 26ê Befranbarê, kolberek bi navê Yehya navbang nediyar li ser sînorê Newsûdê ser bi bajarê Pawe bi teqeya hêzên çekdarên rejîmê lingê wî bi dijwarî birîndar bûye.

Hevdem roja 26ê Befranbarê, Îdrîs Îsmaîlî temen 30 salî û xelkê Seqizê bi teqeya hêzên çekdare rejîam Îranê li ser sînorê Bane bi dijwarî hate birîndarkirin, ev kolber ji aliyê wan hêzên çekdar ve keftiye ber lêdan û kutanê.

Îdirîs Îsmaîlî ku bavê zarokekê ye di halekê de ku bi sedema birîndarbûnê şiyana rabûn û hereketê nebûye bi vî halî hatiye bicîh hiştin ku piştre ji aliyê xelkê deverê ve bo nexweşxaneyê hatiye veguhastin, û rewşa navbirî nebaş hatiye ragehandin.

Herwisa êvareya roja Yekşemî 24ê Befranbarê, 2 kolberên xelkê Seqizê yên bi navên Cewher Muradî temen 28 salî û Hemîd Ehmedî temen 23 salî liser sînorê Hengejal a Bane bi teqeya rastewxwe a hêzên çekdare rejîmê hatine birîndarkirin.

## Rejîmê gefa bidarvekirina 3 ciwanên Kurd kiriye




Dadgeha rejîmê li bajarê Bokanê, tohmeta “Îfsad fî Erz” bi ser 3 ciwanên xelkê Bokanê ku li pêvajoya Şoreşa “Jin Jiyan Azadî”yê de hatibûne binçavkirin, sepandiye û gefa bidarvekirina wan xwariye.

Pêka rapora Rêkxirava Mafê Mirovî ya “Kurdpa”yê, 3 ciwanên Kurd ên bi navên “Reûf Şêxmeirûfî, Kameran Soltanî û Mihemed Ferecî” ku li pêvajoya şoreşa “Jin Jiyan Azadî”yê de ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîmê ve hatibûne binçavkirin, ji aliyê dadgeha rejîmê ve tometa “Îfsad fî Erz” li wan dane û gef li wan hatiye xwarin ku dê wan bidar vekin.

Herwisa Kurdpayê daye zanîn ku li halekê de ku ew 3 ciwanên kurd 10 mehan ji mafê parêzer bêpar bûne, piştre ji aliyê rejîmê ve hatiye ragihandin ku parêzer bo wan hatiye diyarîkirin lê ne melbat û ne ew 3 ciwanên Kurd nizanin ku kê bûye parêzerê wan û heta dema dadgehîkirinê dê bênê nasandin.

Hêzên ewlehî û dadweriya rejîmê digel danîna barimte bo azadkirina demkî ya wan ciwanan dijayetî kirine.

Pêka rapora Kurdpayê, ew 3 ciwanê Kurd piştî binçavkirinê bo girtîgehên ewlehî yên rejîmê li bajarê Urmiyê hatibûne veguhastin û hêzên ewlehî yên rejîmê hewl dane ku li jêr îşkenceyan de îtirafa bi zorê ji wan verbigrin û kuştina kesekî ser bi rejîmê bêxin stuyê wan. Ew ciwanên Kurd rastî îşkenceyên gelek dijwar ên fîzîkî û hundirî hatine.

## Rejîma Îranê li vê heftiyê de 6 kes li girtîgeha Krecê de bidarvekirine




Li girtîgeha Navendî ya rejîmê li bajarê Kerecê de 6 welatiyên Kurd bi tohmetên peywendîdar bi madên hişber hatine bidarvekirin û bi giştî li 2 heftiyên derbasbûyî, rejîmê 19 welatiyên Kurd bidar vekirine.

Pêka rapora Rêkxirava Mafê Mirovê ya “Hengaw”ê li sibêdeha roja Yekşemî 24ê Befranbarê 6 welatiyên Kurd ên bi navên “Ehmed Letîfî, Ekber Xuremtaş, Elîekber Muradiyan, Emîrhisên Melekî, Hadî Nezerî û Elî Mîrî” yên xelkê bajarên “Kirmaşan, Hersîn û Sehne”yê li girtîgeha navendî ya rejîmê li bajarê Kerecê de bidar vekirine.

Pêka rapora “Hengaw”ê li wan 2 heftiyên derbasbûyî de 19 welatiyên Kurd li girtîgehên rejîma Îranê de hatine bidarvekirin.

Ew 6 welatiyên Kurd bi tohemên peywendîdar bi madên hişber, ji aliyê rejîmê ve cezaya bidarvekirinê bi ser wan de hatibû sepandin.

Heta niha ragihandin û berpirsên rejîmê li derheq bidarvekirina wan welatiyan de ti nûçe an raporek belav nekirine.

# Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (462)

